Şîroveyên derbarê pêşdibistan, dibistana navîn û navenda rekreasyonê

Pêşdibistan, dibistana me ya navîn û navenda me ya rekreasyonê bi berdewamî dixebitin ji bo ku çalakiyên xwe pêşde bibin. Ji bo vê yekê, şîroveyên we ji bo pêşdeçûna dibistanê û kalîteya kar girîng e. Eger pêşdibistan, dibistana navîn û navenda rekreasyonê li gor daxwaza we nîne, an jî hûn an zarokê we ji ber tiştekî aciz in, ji kerema xwe her wekî li jêr hatiye terîfkirin bi Ofîsa Zarok û Perwerdehiyê re bikevin nav têkiliyê.

Mirovên ku destpêkê bi we re bikevin têkiliyê xebatkarên pêşdibistanê û yên navenda rekreasyonê ne, an jî şêwîrmendek / mamosteyek ji dibistana navîn e; piştre jî gerînendeyê ku saziyê bi rê ve dibe berpirsiyar e. Eger hûn bi wan danûstandinên derbarê pirsgirêka xwe razî nebin, hûn dikarin serî li Ofîsa Zarok û Perwerdehiyê ya şaredariyê bidin. Şîrove û gilî û gazindên we dê bên nirxandin û çi pêwîst be dê bê kirin. Piştre jî agahî dê ji şexsê ku agahdarî daye û ji saziya berpirsiyar re bê şandin.

Ji bo ku hûn şîroveyên xwe bi şiklekî dîjîtal qeyd bikin û bişînin, lînka li jêr rûpelê bitikînin, “şîrove an jî gazind”.* Hûn helbet dikarin şîrove û gazindên xwe bêyî diyarkirina navê xwe bişînin, lê eger ku hûn dixwazin derbarê pirsgirêka xwe ji me bersivekê wergirin pêwîst e hûn nav û agahiyên xwe yên ragihanê diyar bikin.

Eger derfeta we ya qeydkirina nêrînên xwe ya bi şiklekî dîjîtal nîne, ji kerema xwe ji wê navnîşanê re wek poste bişînin:

Bollnäs kommun
Barn- och utbildningskontoret
Stadshustorget 2
821 80 Bollnäs

Eger hûn bi eleqeya şaredariyê ya derbarê şîrove an jî gazinda we razî nebin, hûn dikarin raportekê bişînin Swedish Schools Inspectorate.

Eger hûn derbarê pêşdibistan, dibistanên navîn û navendên rekreasyonê yên taybet ên li şaredariyê xwedî şîrove an jî gazindan bin, divê hûn rasterast herin saziyên têkildar.

Ji bo şîroveyên derbarê dibistana ser a navîn an jî derbarê dibistana ser a navîn a ji bo xwendekarên bi pêwîstiyên taybet, divê hûn herin Navenda Perwerdehiyê ya Hälsingland (Hälsingland Education Association), www.hufb.se

Ji bo nêrîn û gazindên xwe li vir bitikînin

*Şîrovekirin prosedura nivîskî ya Şaredariya Bollnäs ya ji bo eleqedarbûna bi gazindeyan e ku di qismê 4 beşa 8 a Qanûna Perwerdehiyê (2010:800) de hatiye terîfkirin.